Kurdische Übersetzung (Kurmanci)

Agahdariya çapameniyê

Völklinger Str. 49

40221 Düsseldorf

Telefon (0211) 5867-3505/06

presse@msb.nrw.de

Coronavirus: Li hemû dibistanan perwerde heya piştî betlana Osternê hat rawestandin.

Avahiya Wezaretê: Ji bo pêşî girtina Coronayê li tevayê welat rawestandina karê perwedeyê hate girtin.

Wezareta Perwerdê ya Eyaleta Nordrhein-Westfalen dide zanîn:

Düsseldorf, 13. Adar. 2020. Hukumeta Eyaletê îro biryarek girt, li hemû dibistanên Eyaleta Nordrhein- Westfalen divê karê perwerdê ji duşema 16. Adar. 2020 an heya dawiya Betlana Osternê, 19. Avrêl. 2020 were rawestandin. Wezîra Dibistan û Perwerdê Yvonne Gebauer vegot: „Ev biryara Hukumeta Eyaletê girtiyê, ne tenê ji bo xwendekaran her wiha ji bo malbatan, mamosteyan û rêveberiya dibistanan gelek girin e. Ev gava hatiyê avêtin, gorî rewşa niha diyarbûye, bi pîvan e û rast e. Girtina dibistana ji bo ev nexweşî belavnebe divê tedbîrên werin girtin re dibe alikar. Ji bo malbatên dixebitin, bi taybeti kesên di qada tenduristiyê de kar dikin, cihên zarok lê bimînin û ji bo çavderîyê we cih werin tarxankirin. Bi vêya em ê ji pergala tenduristiyê û saziyan re bibin alikar.“

- **Wezareta Perwerdê ya Nordrhein-Westfalen li ser cihên çavderiya zarokan were kirin û azmûnên xwendekarên agahî ji hemû dibistanan re tê şandin. Niha em ê wisa tev bigerin:**
- **Ev navnera perwerdê ya 16. Adarê heya dawiya betlana Osternê ji programa azmûnên Abiturê re nabe asteg. Jiberku xwendekaran berê ev heqa bi destxistine. Ger rewşa vê nexweşiyê dijwartir bine xwendekar dikarin bi her ahwayî paşê van azmûnan çêbikin.**
- **Li ser azmûnên din yên wekî azmûnên navêndî ji bo sinifa dehan (ZP 10), azmunên dawiya sinifa yazdan(ZKE), azmûnên ji bo tesbitkirinê, azmûnên koleja pîşeyî wê dibistan werin agahdar kirin.**

Wê Wezareta Dibistana tedbirên pêvist bigirin û nehêlin xwendekar ji vê navbera perwerdê zirarê bibinin.

Hemû pêşveçûnên li ser Corona virus wê werin şopandin û ji nû ve werin nirxandin. Biryarên nû wê li ser pêşniyarên Robert-Koch-Institut û Dayreya Tenduristiyê werin girtin. Ev herdu navêndên tenduristiyê wê li ser rewşa nexweşiyê şêniyan agahdar bikin. Wezîra Dibistan û Perwerdê Yvonne Gebauer ragigand wê wezaret gorî pêşketina tevbigere.

Hûn dikarin agahdariyên derberê vê Maila dibistanan de li ser malpera dibistanên Nordrhein-Westfalen bibinin.

Malpera Wezareta Dibistanan agahiyên li ser vê mijarê bi zimanên cûda belav dike.